

Gora Feqiyê Teyran

Faqah Tayrân's Tomb

Abdurrahman Adak* • Yusuf Baluken** • Hayrullah Acar***

Ji zana, edîb û helbestvanên serdema mîrekiyên Kurmancan kê m kes hene ku gorên wan tîn zanîn û nivîstekên li ser kêlên wan hatine xwendin. Lê di vê mijarê de Feqiyê Teyran îstîsnayek e. Lewra berî niha cihê gora wî derketibû meydanê û niha jî kêlên gora wî hatin dîtin û deşîfrekirin. Bi vî awayî zanyariyên derbareyê gora Feqiyê Teyran de bi her awayî zelal bûn. Di vê dokumantasyonê de em dê hem cih bidin belgeyên ku behsa cihê gora Feqiyê Teyran dikin, hem jî nivîstekên li ser kêlên gora Feqiyê Teyran pêşkêşî çihana zanistê bikin.

I. BELGEYÊN KU BEHSA GORA FEQIYÊ TEYRAN DIKIN

Herçiqas derheqê cihê gora Feqiyê Teyran de hinek gengêşe hebûn jî, derketibû meydanê ku Feqiyê Teyran li gundê Hîzanê Şandîsê koçî dawiyê kiriye û li wir hatiye veşartin. Di van her du belgeyên li jêrê de ev tişt bi awayekî zelal hatiye îfadekirin.

A. BELGEYA YEKEM



Ev belge bi Erebi ye û di dawiya menzûmeya Feqiyê Teyran a bi navê “Dilo Rabe” de ji aliyê mustensixê menzûmeyê ve hatiye nivîsandin. Belge ji aliyê Celîlê Celîl ve hatiye bidestxistin (Bnr. Seîd Dêreşî, Dîwana Feqiyê Teyran, Lîs, Ankara 2011, Beşa Pêvekan). Di vê belgeyê de weha behsa Feqiyê Teyran hatiye kirin:

* Doç. Dr., Zanîngeha Mardin Artukluyê, Fakulteya Edebiyatê, Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî, Mêrdîn, Turkiye. / Assoc. Prof., Mardin Artuklu University, Art Faculty, Department of Kurdish Language and Literature, Mardin, Turkey. e-mail: abdurrahmanadak@gmail.com

** Wanebêj, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Fakulteya Îlahiyatê, Beşa Dîroka Îslamê, Mêrdîn, Turkiye. / Lecturer, Mardin Artuklu University, Divinity Faculty, Department of Islamic History, Mardin, Turkey. e-mail: yusufbaluken@gmail.com

*** Dr., Zanîngeha Mardin Artukluyê, Fakulteya Edebiyatê, Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî, Mêrdîn, Turkiye. / Asst. Prof., Mardin Artuklu University, Art Faculty, Department of Kurdish Language and Literature, Mardin, Turkey. e-mail: hayrullahacar@hotmail.com

1. Orjînala Belgeyê



2. Deşîfrasyona Wê

فقہ اسمہ محمد وولادته واصله من
قرية وارزور ومدفنه في قرية شانديس
من قضاء نمرا وأما وارزور قرية من
قضاء مكسي

3. Wergera Wê

Navê Feqe Mihemed e.
Ji gundê Warezûrê ye û li
wir hatiye dinyayê. Li gundê
Şandîsê ku li ser qezaya Ne-
mira² ye hatiye veşartin.
Heçî Warezûr e, ew jî li ser
qezaya Miksê ye.

4. Its translation

Feqeh's real name is Mi-
hemed. He is from the village
of Warezur and was born the-
re. He was buried in the villa-
ge of Shandis, in the district of
Nemira.³ As for Warezur, it is a
village in the district of Miks.

B. BELGEYA DUYEM

Ev belge bi Tirkîya
Osmanî ye û di salnameya

wîlayeta Bedlîsê de di sala 1316/1898an de li Bedlîsê hatiye veşandin. (Bitlîs Vilayetine Mahsûs Salnamedir. İkinci Def'a. Sene-i Hicriye-i Kameriye: 1316, Bitlîs Vilayet Matbaası, r. 174). Li gorî vê belgeyê Şandîs li ser nahiyeya Uçumê ye. Uçum niha jî gundekî Xîzanê ye, nêzî Nûrsê ye. Di vê belgeyê de weha behsa Feqiyê Teyran hatiye kirin:

2 "Nemira" navê eşîreke Xîzanê ye.

3 "Nemira" is the name of a tribe in Khizan Principality.

1. Orjinala Belgeyê



و شیخ حسن حداد و اوچوم ناحیه سنک شاندیس قره سنده لسان
فارسی و کردیبه دلنشین و حکمت آمیز اشعاری بولان فقه طیران

2. Deşifrasyona Wê

و اوچوم ناحیه سنک
شاندیس قره سنده لسان
فارسی و کردیبه دلنشین و
حکمت آمیز اشعاری بولان
فقه طیران مدفوندر.

3. Latinizeya Wê

Ve Uçum nahiyesinin
Şandîs karyesinde lîsan-ı
Farisî ve Kurdî de dilnişin ve
hikmetamîz eşarı bulunan
Feqeh-i Teyran medfundur.

4. Wegera Wê

Û li nahiyeya Uçumê li
gundê Şandîsê Feqiyê Teyran
ê ku di zimanên Farisî û Kurdî
de xwediyê helbestên dilkêş û
bihikmet e veşartî ye.

5. Its Translation

And in the village of
Şandîsê - township of Uçumê Feqiyê Teyran, whose appealing and erudite poems in
the languages of Persian and Kurdish exist, is buried.

C. BELGEYA SÊYEM

Ev belge jî bi Tirkîya Osmanî ye û di salnameya wîlayeta Bedlîsê de di sala
1310/1892an de hatiye weşandin. (Salname-i Vilayet-i Bitlîs, Birinci Def'a. 1310, r.
190). Di vê belgeyê de hatiye îfadekirin ku gora Feqiyê Teyran rojên înan û duşeman
ji aliyê girseya xelkê ve dihat ziyaretkirin. Lê li gorî vê belgeyê gora Feqî li nahiyeya
Spayîrtê ye. Lewra di beşa Nahiyeya Spayîrtê de ev agahî hatiye dayîn. Ji vê jî tê
fêmkirin ku Gundê Şandîsê ku gora Feqî li wir e, berê (dema ku salnameya yekem ha-

tiye çapkirin ku sala 1892 ye) li ser nahiyeya Spayîrtê bû, piştê (dema ku salnameya duyem hatiye çapkirin ku sala 1898 e) bi nahiyeya Uçumê ve hatiye girêdan. Di vê belgeyê de weha behsa Feqiyê Teyran hatiye kirin:

1. Orjînal Belgeyê

2. Deşîfrasyona Wê

ناحیه داخلنده مدفون شیخ
طیران و شیخ سنان حضرتلر
ینک زیارتکا هنده جمعه و بازار
ایرتسی کونلری هر طرفدن بر
چوق زوار تجمع ایدر

3. Latînzeyî Wê

Nahiye dahilinde medfûn Şeyh Teyran ve Şeyh Sinan hazretlerinin ziyaretgahında Cuma ve Pazartesi günleri her taraftan bir çok zuvvar (ziyaretçi) tecemmu eder.

4. Wergera Wê

Li ziyaretgaha Şêx Teyran û Şêx Sînan ku di nava tixûbê Nahiyeya (Spayîrtê) de veşartî ne, rojên Înan û Duşeman ji her aliyê ve gelek ziyaretvan kom dibin.

5. Its Translation

Many devotees from various areas gathered on Fridays

and Monday at the shrines of the Saints Shaikh Tayran and Shaikh Sinan, who were buried within the confines of the district.



مخاتجه بکه و جوراب وشال نسج و اعمال اولتور . ناحیه داخلنده
مدفون شیخ طیران و شیخ سنان حضرتلرینک زیارتکاهنده جمعه و بازار
ایرتسی کونلری هر طرفدن برچوق زوارتجمع ایدر . جاجوان

II. DEŞÎFRASYONA NIVÎSTEKÊN GORA FEQIYÊ TEYRAN

Digel van belgeyên li jorê jî heta niha hebûna gora Feqiyê Teyran a ku li gundê Xîzanê Şandîsê ye, di nava cîhana zanistê de belav nebûbû. Vê dawiyê cihê gora Feqiyê Teyran a li Şandîsê, ji aliyê Müfid Yüksel ve hat dîtin (Bnr. Müfid Yüksel, *Feka Teyran 'in Mezar Şahidesi*, <http://mufidyuksel.com/category/tarihe-notlarim>) û ji aliyê M. Xalid Sadîni ve jî li ser wê danasînek hat kirin. (Bnr. M. Xalid Sadîni, *Feqiyê Teyran 'in Mezar Taşı Bulundu*, <http://www.ilkehaber.com/haber/feqiy-teyranin-mezartasi-bulundu-27816.htm>). Niha em jî dixwazin nivîstekên li ser kêlên gora Feqî digel wêne, deqên orjînal, deqên transkrîbekirî û wergerên wan ên bi Kurdiya Kurmancî û Îngilîzî ji nû ve pêşkêşî cîhana zanistê bikin. Bi vê minasebetê ji bo ku wêneyên kêlên gora Feqiyê Teyran dan me, em spasiyên xwe pêşkêşî M. Xalid Sadîni dikin.

Li jêrê em dê pêşî cih bidin nivîstekên li ser kêla ber serî, piştê jî cih bidin nivîstekên li ser kêla ber pê. Pêwîst e bê gotin ku li ser her du rûyên kêlan jî nivîstek hene. Bi vî awayî bi giştî çar nivîstek derdikevin holê.

A. KÊLA BER SERÎ / THE TOMBSTONE FOR THE HEAD

1. RÛYÊ PÊŞ Ê KÊLA BER SERÎ / FRONTSIDE OF TOMBSTONE FOR THE HEAD

1.1. Wêneyê Wê

1.2. Deşîfrasyona Wê

هذا مرقد السعيد المرحوم المغفور

المحتاج إلى رحمة الله تعالى

محمد المشهور فقه

طيران في سنة ١٠٤١

1.3. Transkrîpsiyona Wê

Hāzā marqad as-sa‘īd al-marḥūm al-maġfūr

al-muḥtāġ ilā raḥmat Allāh Ta‘ālā

Muḥammad al-mašhūr Faqah

Ṭayrān fī sanat 1041



1.4. Wergera Wê

Ev gora dilşad, rehmetî, bexşandî û mihtacê rehmeta Xwedê Mihemedê navdarê bi Feqehê Teyran e ku di sala 1041ê de koçî dawiyê kiriye.

1.5. Its Translation

Here lies Muhammad, known as Faqah Tayran, the celebrated, the content, the forgiven, who passed away in 1041 and is in need of the compassion of Allah.

2. RÛYÊ PAŞ Ê KÊLA BER SERÎ / BACKSIDE OF TOMBSTONE FOR THE HEAD

2.1. Wêneyê Wê

2.2. Deşîfrasyona Wê

وئمنهما خمسين غروش
ووقف على مرقد
فقه طيران
تقبل الله خيره
وإحسانه
آمين

2.3. Transkrîpsiyona Wê

Wa şamanuhumâ hamsîn gurûsh

Wa waqafa ʿala marqad

Faqah Tayrân

Taqabbala Allâh hayrah

Wa ihsânah

Âmîn

2.4. Wergera Wê

Ratiba wan pencih qurûş e. Wî li ser gora Feqehê Teyran weqif kiriye. Xwe-da xer û qenciya wî qebûl bike. Amîn.



2.5. Its Translation

Their wage is fifty cent. He donated it to Faqah Teyran's tomb. May Allah accept his charity and favour. Amen.

B. KÊLA BER PÊ / THE TOMBSTONE FOR THE FEET

1. RÛYÊ PÊŞ Ê KÊLA BER PÊ / FRONTSIDE OF TOMBSTONE FOR THE FEET

1.1. Wêneyê Wê

1.2. Deşîfrasyona Wê

ای دیده اگر کور نئی گور ببین
 این عالم پر فتنه شور ببین
 شاهان جهان سروران
 در زیر زمین در دهن مور ببین
 را قم الحروف إبراهيم المكسي في سنة ١١١٧

Ey dîdah agar kor nahî gor babîn

În 'alamî por-fitnah şor babîn

Şāhanî ġihān-sarwarān

Dar zîrî zamîn dar dahanî mûr babîn⁴

Rāqim al-ḥurūf Ibrāhīm al-Muksi fi sanat 1117

- 4 Ev nezma li ser kêla Feqiyê Teyran, ji ruba' iyeke Omer Xeyyam digel hinek taserufan hatiye wergirtin. Deqê orjînal weha ye: /In the prose of the Feqiyê Teyran's tombstone, from a rubai by Omar Hayyam was taken for some changes on the original text as such:

ای دیده اگر کور نئی گور ببین
 این عالم پر فتنه و پر شور ببین
 شاهان و سران و سروران زیر گلند
 روهای چو مه در دهن مور ببین

(Bnr./See *Rubaiyatê Xeyyam be Xettê Xulameli Muhibbi Nijad*, Tehran, Întişaratî Kîtabserayî Nîk, 1387. r./p. 137.)



1.4. Wergera Wê

Ey çav, eger tu ne kor bî gorê bibîne
Vê cîhana tijî fitne tehl bibîne.
Şahên ku li cîhanê serwerî dikirin
Di binê erdê de di devê moriyan de bibîne
Îbrahîmê Miksî di sala 1118an de ev nivîstek nivîsandiye.

1.5. Its Translation

Oh eye, should you not blind to see the grave
See the world filled with bitter instigation
Those kings ruling the world,
Underground see in the mouth of the ants.
The calligrapher of the book was Ibrahim Miksi in 1118.

2. RÛYÊ PAŞ Ê KÊLA BER PÊ / BACKSIDE OF TOMBSTONE FOR THE FEET

2.1. Wêneyê Wê

2.2. Deşîfrasyona Wê

يا الله
قد اشترى أمير
الأعدال المكرم حسين بك
ابن شرف بك ...
.....
وقطعة الأرض



2.3. Transkrîpsiyona Wê

Yâ Allâh

Qad îstarâ amîr

al-a' dal al-mukarram Husayn Bak

Ibn Şaraf Bak ..

...

Wa qiţ' at ...al-arđ

2.4. Wergera Wê

Ya Allah, Mîrê herî adil û rêzdar Huseyn Begê kurê Şeref Beg kiriye. parçeyekerd.

2.5. Its Translation

O god. The justest and respectful prince Prince Husayn, the son of Prince Sharaf purchased a part of land.

ENCAM

Wekî encam ji her sê belgeyên ku di serî de hatine weşandin tê fêmkirin ku gora Feqiyê Teyran li gundê Şandîsê ye. Şandîs di sala 1892yan de li ser nahiyeya Spayîrtê ye û di sala 1898an de li ser nahiyeya Uçumê ye. Niha hem Spayîrt, hem Uçum, hem jî Şandîs gund in û li ser qezaya Xîzanê ne. Xîzan navekî xwe yê dî bi navê “Nemira” jî heye. Her weha ji belgeya sêyem jî tê fêmkirin ku weke kevneşopiyekê gora Feqiyê Teyran her hefte rojên înan û duşeman ji aliyê xelkê herêmê ve dihat ziyaretkirin û bi çavê kesekî pîroz lê dihat nêrîn.

Ji nivîstekên li ser kêla gora Feqiyê Teyran jî tê fêmkirin ku Feqî di sala 1041/1632yan de koçî dawiyê kiriye. Mîr Huseyn ji eşîra Nemira ye û mîrê Xîzanê ye. Bavê wî Mîr Şeref Beg mîrekî navdar bûye. Mîr Huseyn, di sala 1117/1705an de, piştî koça Feqî ya dawiyê bi qasî 76 salan gora wî ava kiriye. Mîr Huseyn di heman salê de li Xîzanê ji bo mesrefên gora Feqî weqfek jî saz kiriye û ji bo micêwirên gorê 50 qurûş ratib tayîn kiriye. Katibê nivîstekên gora Feqî Îbrahîmê Miksî ye û rûba' iyeke Omer Xeyyam bi Farişî li ser kêlê nivîsandiye. Ev jî nîşan dide ku Omer Xeyyam wê serdemê di nava rewşenbîrên Kurdan de kesekî pêbawer bûye. Divê ev jî bê gotin ku mîrên Xîzan, Miks û Spayîrtê ji heman malbatê ne. Xuya ye ku têkiliya hatina Feqiyê Teyran ji Miksê bal bi Xîzanê ve bi vê yekê re heye.

REFERANS

Bitlîs Vilâyetine Mahsûs Salnamedir, İkinci Def'a. Sene-i Hicriye-i Kameriye: 1316,
Bitlîs Vilâyet Matbaası.

Dêreşi, Seîd, *Dîwana Feqiyê Teyran*, Lîs, Ankara 2011.

Rubaiyatê Xeyyam be Xettê Xulameli Muhibbi Nijad, Tehran, Întîşaratî Kîtabserayî
Nîk, 1387.

Sadîni, M. Xalid, *Feqiyê Teyran'ın Mezar Taşı Bulundu*, <http://www.ilkehaber.com/haber/feqiy-teyranin-mezartasi-bulundu-27816.htm>

Salname-i Vilâyet-i Bitlîs, Birinci Def'a. 1310.

Yüksel, Müfid, *Feka Teyran'ın Mezar Şahidesi*, <http://mufidyuksel.com/category/tarihe-notlarim>.